JI TE BIZAV, JI MIN DERAV

Çîman Kanîkî

Jiyana niho em tê de dijîn, gelek guhorîn ketîne tê de, ne mîna berî çend sala ye, beriya çend salan em dişên, ta radekî, gelek tiştan, bi kar neînin, tenê dewlemend û sermayedaran dikarîn bi kar bînin mîna: Tv û telefon...htd lê me bê van core amûretan jiyana xwe bi asanî derbas dikir, lê niho ev bûne pêdivên jiyanê, ku berî çend salan nepêwîst bûn. Niho piraniya mirovan nizanin pêdivî bi çi heye yan çi bo jiyanê pêwist e ku heta hetayê sax bimîne , ku di her civakekê de çîna hejar û dewlemend û rewşenbîr hene, çîna yekem ya hejariye ku ew jî heya niho bi hejarî û asayî dijîn, ez dikarim bibêjim vê çînê, çîna nediyar ku hemû karê ne diyar dikin û wê bêjin filan dewlemend e û partemanek ava kiriye lê nabêjin çîna hejar ew bi perekî kêm avakiriye û çîna dî ya dewlemendan, ev di nav her civakekê de bi deshilat tirîn çîn dihête hejmartin û kontirolê li ser civakê dikin, vê çînê bi tinê ber li komkirina pera ye û zanîna bihayê dolarî û kar li ser intirnêtî.. htd.

Çîna din ya rewşenbîran: Heger min civakek kiribiya çîn çîn, da hemûyan bikime çîna rewşenbîr û hejaran, ji ber ku rewşenbîr çendê hejar bin ma dem yê rewşenbîr e dê civakî ber bi hizrên baqij û ciwan bibe.

Rewşenbîr jî ew kes e yê karekî berçav dike yan dupeyvan li ser Tv dibêje. Rewşenbîr li cem hemû miletan peyveke pir biha ye. Heger behis li ser dewletê bihête kirin li berahiyê dê behsê rewşenbîriya wan hête kirin ka çawan serderiyê di gel xwe û paşan li gel dewletê bikin, ji ber ku kesê rewşenbîr bi çavekî baş li hemû xelkê dinêrin, bê cêwazî û serederiyê weku yek di gel hemû çînan dikin û di hemû warên jiyanê de şareza ye.

Evca heger miletek piraniya wî rewşenbîr be dê xweşbextiya wî misoger be û jiyaneke xweş û geş be.